Mewlana/Melayê Cizîrî û Dîwana wî ya hunerşah beş -1-

Ji nivîsîna: Emîn Narozî

Dîwana bêhempa ya ustadê hunera honan û rewanbêjiya edeb û suxenê Melayê Cizîrî hê ji dema zaroktiyê ve gava ku feqî bi mela û şêxan re dihatin gund û honraweyên wî bi beytikî dixwendin û bi qesîdeyî digotin çendî ku em zarok bûn jî lê dîsa pir bala me dikişand û em jî li goşe û quncikê ber derê eywan û odeyan li ber solan li dora wan kom dibûn û bi dilekî xweş me li wan guhdarî dikir û carina jî bi dizî me li dû wan digot heya çend riste ji wan ji ber dikir û dû re gava em zarok xwe bi xwe diman me ji hev re ew digotin. Demek piştre wextê em hinekî givroktir bûn û mezinan em danîn ber xwendina Quranê, apekî me yê nexweş hebû ku çend sal bûn ew xweser li erdê dima û nikaribû rabe bigere, carê gazî me dikir û bi me ew qesîde didan xwendin û gotin.

Çend sal di pey de dema ku êdî ez xame bûbûm û ji bo xwendinê derketibûm feqîtiyê cara pêşî hingê min nisxeyeke Dîwana Cizîrî ya çapa 1919an li cem feqiyekî ji xwe mezintir dît û ez pir pê şabûm, lê mixabin ku xwendina wê ji min re pir zehmet bû. Çendî ku ew kitêbên erebî ku me dixwendin jî weke wê bê zêr û ziber bûn û ji xwe hê berê jî min hinek kitêbên kurdî/kurmancî yên mîna Mewlûda Kurmancî ya Ertûşî/Bateyî, Nûbihara Biçûkan û ´Eqîdeya Îmanê yên Ehmedê Xanî, Nehcilenama Mela Xelîlê Sêrtî, Tesrîfa Kurmancî, Terkîb û Zirûfa Helqetînî bi dersîtî xwendibû û ji ber jî kiribû, lê digel vê jî xwendina wê ji min re ne hêsa bû.

Min ji wî hevalê xwe yê mezintir û bi kitêbên xwe jî li jortir hêvî kir ku ew li pêşiya min Dîwanê bixwîne da ez jî fêr bibim. Tê bîra min wî çend rûpel qelabtin û dû re qesîdeya "Mey nenoşî Şeyxê Sen´anî Xelet" bi nikleke xweş û dengekî zîz xwend. Wî pir xweş ew dixwend. Ew çend qesîdeyên din jî li pêşiya min çû û dû re jî çend rojan Dîwana xwe ku wî jî ji cihekî deyn kiribû da min. Dîwana Cizîrî çend rojan li cem min ma, lê hê jî xwendina wê ji min re zehmet bû û ez lê ne rewan bûm.

Heçî maneya wê ji xwe hê zehmettir bû, ji bilî çend ş´irên zimanhêsa min kêm jê fahm dikir ta ku em ji bo xwendinê çûne Girikê/Silopya cem Seydayê Seyd Hesen (r. x.) ku li wê derê min Şerha Zivingî ya bi navê ´Iqd elCewherî/Gerdeniya Gewherî dît. Ew hem zêr û ziberkirî bû ku xwendina Dîwanê pir hêsatir dikir û hem jî bi xêra wê min maneya wê jî çêtir fêhm dikir. Hingê hê bêhtir min çêş ji Dîwanê girt û hindik be jî bi hunerê honan û rewanbêjiya Cizîrî hisiyam. Lê bi rastî jî têgihîştina ustadê mezin mewlana Cizîrî û çêşwergirtina tam ji honraweyên wî di dema transikribekirina me ya sala 1987an de ji min re çêbû û ez hingê pê hisiyam ku ew çi deryayek e bi mircan û mirarî û yaqût û zumrûdan dagirtiye.

Vêca ji hingê ve min xwest ez hê bêhtir li ser rawestim û serê pêşî jî min Şerha Zivingî bi alîkaraiya Şefîq Kaya ku carekê çûbû Sûriyê û ew ji min re anîbû bi dest xist û piştre jî hino hino ez li ser xebitîm û min dest bi wergerandina wê kir ku hinek jê di kovara hunerî, edebî û çandî ya Nûdemê de jî di dema xw de hatibû weşandin. Pê re jî çiqas çû nirx û hêjayiya Dîwanê li cem min bêhtir bû û min xwest ku herkes Melayê Cizîrî û hunerê wî yê honraweyî ku li gorî min rewanbêjtirîn û suxenwertirînê serdema xwe bûye, fêhm bike, qenc tê bigihê û bibîne ka vî ustadê honan û ristina suxenê/gotinê çawa zimanê kurdî bi taybetî jî zaravayê kurmancî bi bilindtirîn û rêkûpêktirîn xwedristiyê bi kar aniye.

Îcar piştî temamkirina wergerana Şerha Zivingî çiqas ez li ser xebitîm min hê bêhtir Cizîrî nas kir û ez têgiham ku belê Dîwana wî bi rastî şahberhemek e ku divê ji her hêlê ve û pir bi balkêşî li ser bê rawestan û lêkolînên berfireh li ser bên kirin.
Lê belê çawa ku Cizîrî jî di vê risteya jêrî de diyar dike:

"*Da min siroş wer mey binoş zewq û xwiroş lew çûm ji hoş*
Ji wê ´işweya yar bû xwiya ew ne ji meya engûr-i bû"

Çunkî her carê ez vê Dîwana wî ya giranbiha ku çiqas pesnê rewanbêjî û suxenweriya wê û hunera honan û ristekirina wê ya bedew î bêhempa bê dayin jî hê kêm e û ji xwe çawa tê gotin "ew û Dîwana xwe ji pesnê zêde ne", dixwînim ez hinek destnîşaniyên nû tê de dibînim û dibêjim vê carê temam êdî min hemî tiştên tê de derxistiye, lê çi gava ez ji bo zanîna tiştekî yan gotinekê lê vedigerim dîsa ez bi hinek desnîşaniyên din dihisim. Ji ber vê jî ez li hev şaş bûme qenc nizanim ka gelo ne ez ji ziman û rewanbêjiya Melayê Cizîrî û Dîwana wî ya kêmhempa û têr û tije bahs bikim yan jî ji li ser nêrîn û ramanên wî yên tesewifî, felsefî, stêrnasî, evîndarî, civakî, siyasî û yên din rawestim.
Ji ber ku bi rastî wî tu babet nehiştiye ku jê salox nedaye yan jî destnîşan nekiriye. Bêguman Mela ne bi tenê hema ji bo nivîsîna çend şi´r û qesîde û xezelan 30-40 salên xwe daye vê dîwanê, lê çawa dixwiyê wî xwestiye ku berhemeke welê biafirîne ku ji hemî babetî tê de hebe û ewqas bi hikmet û felsefe û zanînên din dagirtî be ku bi çendîn şerh û tefsîran jî têr û qenc dê ravekirin û têrî têgihîştina temamê naveroka wê neke.

Ji xwe ger wî jî mîna gelek zanayên kurdan yên berî xwe ev 30-40 salên xwe bidana zimanê rewac yê hingê erebî û farisî yan jî yê desthilatdarê osmanî û bi wan kitêb binivîsanda bi kêmasî niha 15-20 kitêbên wî hebûn. Lê belê wî zimanê xwe yê kurdî di ser re girt û demeke dirêj li ser xebitî da şahberhemeke weha biafirîne ku karibe hemberiyê bi gelek giranbehatirîn û navdartirîn berhemên berî xwe, yên serdema xwe û heta bi yên piştî xwe re jî bike. Bi rastî xebata li ser kitêbeke weha ku mîna kitêbên semawî hemî tiştî hew bi i´caz û îşaretan bi kurtî destnîşan dike ne hêsa ye, ji ber vê jî ez dê li vê derê hema çend babetan bi kurtî bînim pêş çavên hunerperweran.

Bêguman divê û pêwîst e dûr û dirêj li ser Melê û Dîwana wî bê rawestan û lêkolînên berfireh li ser bêne kirin, ku dilê min jî dixwaze ez vê xebata xwe heya ji min bê berfireh bikim û bigihînim radeya lêkolûneke hê berfirehtir ku layiqî şan û hêjayiya Mela û Dîwana wî be. Çendî ez dizanim ku bi rastî ez bi xwe ne fêris û palewanê vê meydanê me û rabûna bi karekî weha ve ji hêz û biriya min der e jî lê dîsa jî min divê ez xwe lê biceribînim û hê ku agahdariyên min yên ser vê Dîwanê taze ne tiştê di tûrikê min de heye raxim ber çavên dildarên hunera Cizîrî û bi hinek agahên cem xwe dakevim nav vê qadê.

Heçî li ser jiyana Cizîrî û rewşa wî di gel hêjayî û giranbihayiya wî bi xwe Zivingî hem di gelek cihên şerha Dîwanê de û hem jî di pêşgotin û paşgotinê tev de digel gazinên xwe ji yên berî xwe jî baş li ser rawestiyaye û kêm û zêde heya jê hatiye bi berfirehî li ser nivîsîye û gelek tişt destnîşan kirine ku ew dê di pêşgotina wegerana şerha Zivingî de jî bê dîtin.

Bi vê re jî divê binumêm ku seydayê şareza Zivingî xwedî maf ji bo neparastin û guhnedana berhemeke weke vê Dîwana şaheser î giranbiha ku wê hevtayê çend dîwanên bilindtirîn û bêhempatirîn yên rojhilata navîn û belkî yên cihanê dibîne, rexneyên tûj li zana û rewşenbîrên kurdan yên berî xwe dike û herweha dîsa gelek rexneyan li gelek ronakbîr û nivîskar û lêkolînerên serdema navîn û yên mîna Îbn ul-Esîrên bira, Îbn ul-Hacib, Îbn Xelikan, Îbn us-Selah, Îbn ul-´Izz û yên din yên li pey wan dike ku çima qet nebe ji kitêbên xwe yên pir hima çendekan ji wan bi kurdî nenivîsîne.

Bêguman rexneyên wî hemî di cih de ne, lê dîsa jî mirov divê bipirse ka gelo çima wî ev şerh bi kurdî yan jî bi kurdî û erebî tev nenivîsîye? Weke ku dixwiyê ew jî mîna yên berî xwe digel hişyariya xwe ya neteweyî jî dîsa xwe ji tesîra zimanê dînî û yê desthilatdaran xelas nekiriye û li dû rêçika wan domandiye herweke ku Mela Ebd us-Selam Naciyê Cizîrî (1878-1952) jî ku li gor agahên niha hê berî wî jî dest bi ravekirina Dîwanê kiriye û Zivingî bi xwe jî pesnê wî û zanîna wî daye û ji bo alîkariyê jê re spas jî kiriye, ne bi kurdî lê bi erebî Dîwan şerh kiriye.

Li vê derê divê bê gotin jî ku herçiqas Seydayê Zivingî li xwe datîne ku alîkarî ji Mele Ebd el-Selam Nacî wergirtiye jî lê ew ne qala awayê alîkariyê dike û ne jî diyar dike ku ew jî hê berî Zivingî bi karê şerha Dîwanê ve rabûye, lê hê berî ku biqedîne û bide weşanê

wefat kiriye. Herweha ew qet nade xwiya kirin ku wî şerha Nacî ya destnivîs ji zaroyên wî deyn kiriye, demeke dirêj li cem xwe hiştiye û gelek fêde jî jê wergirtiye. Ew qet vê behs û bazarê jî nake û weke ku haya wî jê tunebe hew behsa alîkariya jê dike, lê bi çi awayî ew ne zelal e.

Lê di gel vê jî ew gotinên ku berê hê di salên 1965-66an de nemaze di nav feqî û melayan de belav bûn û dihat gotin ku Zivingî piştî mirina Mela Ebd us-Selamê Cizîrî [E. S. N. C.] rabûye Şerha wî ji nû ve nivîsandiye û ew li ser navê xwe weşandiye, tam ne rast e. Lewra ger mirov wan bide ber hev çendî ku di hinek cihan de sûdwergirtina jê xwiya bike jî lê bi gelemperî cudahiyek di nav wan de heye. Ya Zivingî ji ya Nacî hem gelek berfirehtir û têr û tije tir e û hem jî ji hêla zimanî ve jî hişktir û weke ku dixwiyê sererasttir û bi serûbertir e. Lê belê ya Mela Ebd us-Selam temamnebûyî dixwiyê û hinek cih tê de ravenekirî û vale mane çawa ku ji xwe T. Îbrahîm Dosikî jî di dema sererastkirina wê de destnîşan kiriye.

Sala Bûyîna Cizîrî

Çendî ku di sala 1987an de gava cara pêşî me Dîwan bi tevayî transkribe kir û bal kişand ser tarîxa bûyîna Melê di risteya *"Ji herfan mah û salê ma nehat der şeklê falê ma"* ya di hunraweya wi ya pêşî de ya *"Newaya mitribû çengê fixan avête xerçengê"* em sed der sed ne ewqas dil bi cih bûn lê dû re bi dîtina hinek tarîxên din ku ustad Cizîrî di çend risteyên din de destnîşan kiriye dilê min bêhtir li ser wê tarîxê kete cih.

Çawa ku piştre gava van risteyan bala gelek lêkolînerên hêja yên din jî kişand û ew hê çêtir li ser xebitîn û ew bi pêşdetir ve jî birin û dû re bi vê xebata xwe ya ser vê wergerana Şerha Zivingî êdî ez qenc serwext bûm ku Melayî di çendîn risteyan de bal kişandiye ser hinek tarîx û bûyeran. Ew risteyên balkêş ku Cizîrî bi wan çend tarîx û bûyer destnîşan kirine, çawa ku pêşî E. Narozi & Z. Kaya, dû re jî A. Durre, T. I. Dosikî, C. Yöyler, A. Bakî Turan û M. N. Doru jî di xebatên xwe yên ser Dîwana Cizîrî de heryek hinek ji wan destnîşan kirine ev in:

1. Bûyîna Melê, êdî diyar û piştrast jî bûye ku Melayê Cizîrî di vê risteya: *"Ji herfan mah û salê ma nehat der şeklê falê ma"*, yan jî li gor çapa *Baxdayê* *"Ji herfan mah û salê ma nehat der şiklê xalî ma"* xwestiye roja bûna xwe diyar bike.
Îcar ger ku ev riste li gor çapa *Baxdayê* be, hingê sala bûna Cizîrî ji gotinên " *xalî û herfan*" derdikeve, çawa ku me jî di sala 1987an de dema transikrîbekirina herfên Dîwanê ev riste li gor çapa Bexdayê girt dest û bi hisabê ebcedê ji gotnên "خاليû **حرفان**: *xalî û herfan*" (**حرفان**): 339+ (خالي): 641= 339+641:980/1570-72, Derxist.[1]
Lê belê li gor vê çapa di destê me de ku *"Ji herfan mah û salê ma nehat der şeklê falê ma"* ye, tarîxa bûna ustadê mezin Cizîrî li gor "hesabê ebcedê/cumelê suxra" ji van gotinên jêrî derdikeve:
herfan(**حرفان**)=ح:8+ر:200+**ف**:80+ا:1+ن:50=339+mah(**ماه**):م:40+ا:1+ه:5=46+(**سال**):س:60+ا:1+ل:
30=91+ma(ما)=م:40+ا:1=41+(**شكل**) ش:300+ك:20+ل:30=350+(**فال**):**ف**:80+ا:1+ل:30=111.
339+46+91+41+350+111=**978/1570**
Ev tarîx hinek ji ya Tehsîn Îbrahîm Dosikî ku di pêşgotina ser Şerha Dîwanê ya Mele Ebd el-Selamê Cizîrî de derxistiye (**975/1567-68**) cuda ye, lê bi ya min divê wî "ن:N"ya "**حرفان**:herfan" neavîta, lê ji dêl ve "**ما**:ma"ya duyemîn û "و:w"yê nehejmarta, çunkî "و:w" ne ji eslê gotinê ye û "**ما**:ma" jî dubare ye.
Ji xwe li gor daneberheveke din ku D. N. Mackenzie di pêşgotina berhema Feqiyê Teyran ya *Şêxê Sen´anî* de jî kiriye, dibe 980[978]/1570.[2]

2. Herweha Ustad cizîrî bi van risteyên jêrîn:
Turkê xwînrîz û xumarî me bi yek xemzeyekê
Zuhdê çilsale li min zêr û zeber kir ji esas
jî diyar dike ku dema wî ev şi´r nivîsîye çil salî bûye

3. Çawa ku Cizîrî di risteyên:

Ellah li min hubba te çi şekker û nebat e
Ji nû ve dê ciwan bim ger bihn bikim gula geş
de temenê xwe yê dema xelaskirina Dîwanê yan jî nivîsîna vê honraweyê diyar dike ku bi hesabê cumelê suxra jigotina :“**Ellah** الله” derdikeve:
ا:1+ل:30+ ل:30+ه:5=1+30+30+5=**66**.

4. Dîsa Cizîrî di risteyên jêrîn de jî
Sih sal e ji derd û ji belayê te hilak în
Hetta bi felek her diretin ah û ehê min
yan diyar dike ku dema nivîsîna vê honraweyê sihsalî bûye yan jî wî di sihsaliya evîndarî û mutesewwifiya xwe de nivîsîye.

5. Di helbesta “*Me ji dil nêrgizên xasse divên*” de çawa ku dixwiyê Melê di risteyên jêrîn de jî li gor hesabê ebcedê tarîxa temamkirina nivîsîna Dîwana xwe destnîşan kiriye:
Lew elif tên me di herfên falan
Ku li şeklê reqemê sersalan
Ji ber ku “elîf tên” bi piranî ye divê bi kêmasî du “اليف:ا bin; vêca li gor hesabê “*Cumelê suxra*” (hesabê Ebcedê) ji “elîfekê:ا”roja 1ê meha yekê ji serê sala koçî ku Miherrem e û ji yekê jî meha 1ê ya sala koçî derdikeve û ji Şekl (شكل): 350, reqem (رقم): 340, sersal (سرسال): 351= 350+340+351 jî sala 1041ê derdikeve. Yanî Mela vê qesîdeya xwe ku paşiya dîwana eslî ye, di 1-1- 1041/ 29-7- 1631ê de nivîsîye.[3]

Mela û Evîn
Çawa ku ji we ve jî eyan e Cizîrîgelekgirîngî daye evînê û di şi´rên xwe de jî ew baş li ser evîn û cûreyên wê û bandora wê ya li ser felsefe û tesewifê rawestiyaye û evîn sedemê afirandina gerdûnê bi giştî û afirandiyên tê de jî bi taybetî dîtiye û ewqas pê ve çûye ku wî evîn li herçar hêmanên afirandinê yên *ax* û *av* û *hewa* û *agir* zêde kiriye, ew weke hêmana pêncemîn û sedemê afirandina gerdûnê dîtiye û yek ji hîm û bingehê hebûna mirovatiyê hesab kiriye. Herweha ew evîn û perweriyê ji rindî û bedewiya ezelî ya herhebûyî dibîne û vê nêrîna xwe bi risteyên jêrîn bi awayekî felsefî weha derdibire:
Me cewher ‘unsurik xamis numa îro di tali‘ da
Di vê teqwîmê insanî li tali‘ bûne fal ebrû

Li vê derê Mela dîtina Farabî, Ibn Sîna û Ibn ´Erebî ku evînê sedemê afirandina gerdûnê dibînin qewî dike, lê hê bêhtir pê ve diçe û wê li her çar hêmanên berê ku fîlozofên rojava (yûnanî) tesbît kiribûn zêde dike û wê hêmana pêncemîn û bingehê her çarên jorîn dibîne.

Bi gotineke din ew bi vê re jî aşkere diyar dike ku di afirandina mirovî ya bi vê bîreweriya xurt de ji bilî av û ax û agir û bayê hêmaneke pêncemîn jî heye ku evîn e û ew bingehê van her çaran e. Lewra afirandineke bi vê spehîtî û lihevanîna van nexş û nîgarên di çehre û laşên mirovî de weke birû, bijang, çahf, dest û pê û yên din di gel ewqas zanîn, şarezayî, çeknasî û bîreweriya dahiyane ku bi mirovî re heye çawa ku hem di felsefeya siruştnasî de hatiye pejirandin û herweha di ya xwedawendigarî de jî bi ayetên “*we ´elleme Adem el-esma`e kulleha*: *Xwedayê payeberz Adem fêrî hemî nav û agahan kiriye*” û ”*we le qed xeleqt ul-insane fî `ehseni teqwîmin: Min mirov bi qenctirîn rewşenbîrî û bîreweriyê afirandiye*” hatiye çesipandin û qewîkirin, ev şahberhem ancax bi evîneke xurt î bêhempa pêk tê. Çunkî divê hezkirineke pir zahf bi mirovî re be ta ku karibe li gorî dilê xwe tiştekî bîne pê yan jî icad bike û biafirîne. Nexwe bêhezkirin û evîneke bi hêz û bê dilxwaziyeke ji dil û can pêkanîna erkekê, pîşeyekî yan jî îcadekê pir zehmet û nebûyî ye.

Herweha ew pêwendiya navbera evîn û spehîtiyê di gel ya gerdûnê jî weha nîşan dide:

“*Husnê hub anî zihûr ´işq e eslê ´alemê*
Eslê eşya da bizanî wan çi esl û made bû”

Spehîtiyê evîn diyar kir ku herdu pêkve bûn sedemê afirandin û bingehê cihan û gerdûnê hemî, nexwe divê li gor vê tu bingeh û hêmana tiştan bizanibî û bibînî ka çi ye. Çawa ku di cihekî din de jî dibêje:

Hê di ber qalûbelayê belku ev 'alem nebû
Çerx û dewran dewrê gerdûn gunbedê mîna nebû

'Erş û kursî hêj di mexfî bûn di kenza qudretê
Husnê Heq bû istiwayê lami'a 'işqê hebû

Nehtibûn hukmê sifatan ew ji zatê lem yezel
'Aşiq û me'şûq-i yek bûn şem' û hem perwane bû

Hê berî afirandina rûhan ya dema "qalûbelayê" ku Xwedê gava ew afirandin ji wan pirsî: "*Ma ez ne xweda û perwerdigarê we me*?" Wan jî got : "*Erê, tu Xwedayê me yî*.", berî hebûna cîhanê hemî, berî çerxa felekê, berî ger û dewrana vê gerdûnê tev û berî hebûna vê kunbeta camîn/şûşeyî ya esmanî, berî derketin û diyarbûna Text û Kursiyê hêz û biriya xwedayî, berî van hemiyan spehîtiya tîrêjên rohniya rastî ya xwedayî li navroyê bû û tîrêja evînê jê vedida.
Lêbelê ew ji zatê Wî yê bêneman/bêzewal re nebûbû pesin û taybetmendî û hêj dilgirtî û dilketî herdu jî yek bûn û mîna mom û xecxecoka/perweneya dora wê bûn ku perwane çiqas li dora momê digeriya mom geş dibû û ew çiqas geş dibû perwane jî doş dibû, xwe lê dixist û xwe jê re dişewitand.

Ew hê jî pê ve diçe û weha didomîne:

Husn û cemalê xwast evîn vêk ra di yek zatî cevîn
Nûra qedîm bû 'işq û vîn wan lêk-i naz û 'işwe da

Husn û mehebbet her hebû Heq 'aşiqê zatê xwe bû
Muhtacê husnek dî nebû neql û riwayet pê we da

Spehîtî û rindiyê evîn xwest da herdu pêkve di yek kesî de bicivin û rohniya kevnare ya herheyî jî bû evîn û hezkirin û hemî gihan hev û nazî û delaliyên xwe li hev û du kir. Bêguman spehîtî û dildarî herdem hebûne û Xwedayê payebez jî evîndarê zatê xwe yê qedîm î xweser bû û ji xwe li gor salox û veguhastinên rast î pêbawer ji bo wê evîna xwe ya xweser jî tu pêwîstiya wî bi bedewiyeke din nebû.

Ji xwe Cizîrî di gelek cihên Dîwana xwe de cih dide evînê û xwe jî yek ji hosta û şarezayê evînê dibîne û di rêzên jêrîn de jî baş li ser vê yekê radiweste gava ku dibêje:

Me'nayê 'işqê bêm çi ye lew min bi çeşmê dil diye
'Eksa cemalek safî ye lami' di mir'ata me da

Husn û mehebbet zatek in me'şûq û 'aşiq latek in
Lê sûret û mir'atek in her yek di me'nayê xwe da

Ger dilber û wer 'aşiq in 'arif di vê da sadiq in
Ayîneyê nûra Heq in cih cih di wan da cilwe da

Divê ez mane û naveroka evînê bibêjim û rastiya wê ji we re jî diyar bikim ku çi ye; lewra min bi çavê dilê xwe û bi awayekî derûnî dîtiye ku ew teyisîna şepaliyeke paqij î zelal e di neynika dilê me yê fîq de. Ji xwe bedewî û hezkirin yek in û dildar û evîndar jî yek perestî ne, lê di heman demê de heryek ji wan bi mane û naveroka xwe ya rastîn wêne û neynikeke xweser in. Ew bijareyên ku li gor maneya xwe wêne û nenynik in ew çi dilber û çi jî evîndar bin şareza tê de serwext in ku heryek ji wan neynika rohniya xwedayî ye, çunkî ew cih bi cih di wan de xwiya dibe û derdikeve holê.

Herweha li jêr jî didomîne:

Tu j´ Melayî her bipirs esrarê ´işqê hel dikit
Vê mu´emmayê çi zanin sed mela û muste´îd

Di vê rêzê de ku Mela xwe weke zana û agahdarê ji raz û hikmeta evînê dibîne û dixwaze hem diyar bike ku bi tenê meletiya zahirî ya şerî´etê bê zanîn û nasîna evîna heqîqî têra têgihîştina hêz û biriya evînê û pîrmendiya wê nake û zanayên wê bi tenê nikarin biryarê li ser evîndaran bidin. Jixwe evîna heqîqî jî ku bavekî tesewifê ye ne dijî şerî´et û nessa kitêb û sunnetê ye.
Lê di gel vê giringî û xweşî û pîroziya evînê Cizîrî di gelek honraweyên xwe de cih daye derd û kul û jan û rencên evînê jî ku di vê biwarê de ev herdu risteyên wî yên jêrîn gelek manîdar in û hemî tiştî ji me re dibêjin:

'Işqê ji Xwedê da tu bixwazî jê ra
Ger dê li neyarek xwe bikî nefrînê

Ey dost ger tu bivêyî nifir li neyarekî xwe yê dijwar bikî, ji Xwedê jê re hêvî û lavaya evînê bike bila bikeve tora evînê û êş û renc û azarên dilketinê bikêşe da heyfa te jê bê hilanîn û tu ji dijminiya wî xelas bibî.

Her li ser van derbirîn û dozên Cizîrî wêjenas û şairê mezin yê Almanî Goethe jî wî rast didêrîne û diyar dike ku şairê mezin yê bi navê Nişanî [Melayê Cizîrî] bi rastî qenctirîn kes e ku ji evînê û hêz û birî û hikmeta wê fam kiriye:

Şahberhema kitêban ya evînê ye
Min ew pir bi baldarî xwend
Hindik pelên wê qala xweşiyê dikin
Lê yên din hemî bi kul û keder in
Beşek jê jî tije hicran û cudahî û
babetekî piçûk jî li ser hevgihanê
lê belawela û perîşan.
Bes raveya xem û derdan bi cildan
dirêj dibe, bêhejmar û bêdawî.
Ey Nîsamî [Nîşanî?] axirî te riya rast dît
Kî ye vê raza xerbilî jêk veke,
da evîndar ji nû ve bigihên hev.[4]

Piştî lêzêdekirina hêmana evînê Cizîrî hêmanên berê yên din jî bi van risteyên jêrî rast didêrîne:

Çar ´unsur in çar teb´et in vêkra bi mîzan vêk ketin
Bi hevra muxalifsîret in der sûretê şexsiyye da

Hetta bi mîzan çar esil bi hevra nebin cem´ û wesl
Cisman ji hev nabin fesil bazû ji bazû şeq neda

Çar ummehat in sê benat her bêqerar in bêtebat
Pir ´işq û meyl in iltifat d`vê taze deyrê kuhne da

Hîmê wê alema (gerdûn yan jî ´Erşê) ku hêmana wê ya sereke evîn e li ser çar riknên bingehîn (*av, ax, ba* û *agir*) hatiye danîn û xwedî çar siruştên xwezayî ne (*şilayî*, *hişkayî*, *germayî* û *serma*) ku hemî pêk ve rêzbendkirî û bi pîvan in, lê her yek di tevger û lebta xwe de jî dijî hev û xweser in, (çawa dixwiyê li vê derê Ustadê mezin Cizîrî îşaret bi bal diyalektikê ve jî dike). Ji xwe heya herçar bingehên/hêmanên siruştî bi pîvan û rêkûpêk di cismekî/laşekî de (weke xwîn, zirav belxem û sewda) negihên hev û pêkve nebin yek

ew ji hev cuda nabin û bazuyên wan nabe du şeq. Ew jî çar mak in (*agir*, *ba*, *av* û *ax*, ku çar endamên laş ên sereke *serî*, *sîng*, *hinav* û *zik* heya *nigan* bi wan re li gor vê rêzê û bi pîvan li hev dikin) ku dibin riknê gerdûnê yan jî yê ´erş û sê keç (*heywan*, *nebat* û *hişkeber*, herweha *buxar*, *ewr* û *baran*) in ku di vê xaneya kevnare de ji ber evîneke dijwar û dilbijîn û hogiriya pir herdem bêbiryar û bêtebat in û qet ranawestin.[5]
Herweha dibe ku mebesta Melayî li vê derê çawa ku Doru jî destnîşan dike[6] bi "*çar unsur*/hêman, *çar teb´et*/siruşt û *çar esil*/bingeh"an her diwazde birc bin û bi "*çar ummehat*/mak/dê û *sê benat*/keç/qîz"an jî heft felekên/çerxên esmanan û heft rojgarên wan bin ku li gor hinek stêrnasan her çerxek/felekek yanî esmanek rojgarek tê de ye; çawa ku ev herdu risteyên pey jî vê nêrînê xurt dikin:

Hin suflewî bazî dikin hin meylê evrazî dikin
Xweş reqsek şehbazî dikin sergeşte ne di halê xwe da

Hinek ji wan ber bi jêr ve diçin û dileyîzin û hinek jî berê wan li hevrazî ye; hemî pêk ve reqs û govendeke xweş î şahane dikin, lê di wî halê xwe de sergêj û şaşamayî mane, nizanin dê ta kengê weha bêrawestan bigerin.
Lê bêguman ew ne bêsedem weha sergêj û heyrîmayî digerin, ew ji bo xatirê jiyana mirovan di vê kefteleftê de ne çunkî

Cewherê ´alî ye ´unsur me Mela
Bi l-heqîqet ne ji xwar estuqus în

"ey Mela bi rastî hêmanê me mirovan ji cewherekî behadar î esilzade afirandî ye ne ji bingehekî kêm î bêbiha ye", çawa ku di risteyên jêrî de jî vê yekê destnîşan dike:

Bi husna ehsen it-teqwîm û zahir sûretê zat î
Nezer dî "ellem el-esma`" we batin ´eynê mir`at î

Spehîtiya dildarê ku mebest jê mirov e qenctirîn û rewşenbîrtirîn bedewî ye û ew bi xwe jî berbiçav teswîr û nîgara rindiya rewneqa zatê Xwedê ye ku li gor ayeta "*we ´elleme Adem el-esma`e kulleha*: Wî nav û agahan hemî fêrî Adem (e. s.) kir", bi derûnî bûye neynika cemala wî zatê aferîner bi xwe.
Yanî çendî ku mirov berbiçav madî be jî lê di bingehê xwe de ew evînê temsîl dike û jixwe hemî tişt jî ji bo gihîştina wê evînê hatiye xuliqandin û sazkirin.

Ev riste û yên jêrîn giş diyar dikin ku çawa mebest ji danîna darê xwarina fêkî û berê wê ye wisa mebest ji afirandina gerdûnê jî afirandina mirovî ye ku kamiltirîn afirandiyê Kirdigarî ye. Çawa ku dibêje:

Her neh felek lê kaxik in dûr û diraz wek axik in
Tê dar in ew jî şaxik in vê terhê insan mêwe da

Insan ber e ´alem dirext sultan ji xelwet hate text
Pê zeyyinîn iqbal û bext dewlet ji bala tale da

Sultan ji bala hate xwar lahût bi nasûtê veşar
Peyweste bû nuqta medar dewra ´urûcê gerr we da

Her neh çerx û felekên gerdûnê jî mîna koşkek yan xaneke ku bergehekî fireh î dir

êj û asodûr li ber e û tê de mîna baxçeyekî mezin darên şaxîn î yekcûre şîn bûne û mêwe û berên wan şax û terhan jî bûye mirov û mirovayî.
Yanî cîhan bi xwe dar e û mêwe û berê wê jî ew mirov e ku mîna desthilatdarekî xwedî ferman gava ji valehiya nebûnê derket û hat li ser textê hebûnê rûnişt hingê talih û bext pê xemilîn û di çerxa felekê ya kamîraniyê de dewleta şadiyê hilat û derket. Herweha siltan yanî mirov jî ji payeya bilind ya ezelî daket rêza jêrîn ya hebûn û peydabûnê û bi siruşta xwe ya nasûtî ya mirovahiyê payeya xwe ya xwedawendigarî(lahûtî) nixumand û bû navenda gerra nasûtê/madeyê û xala nîvê çenbera hilkişîn û bilindbûnê.

Bêguman Cizîrî di van honraweyên xwe û gelekên din de jî ramana afirandina mirovan di deverên cihê de destnîşan kiriye, lê bi gelek awayên cihê û pê re jî dîtinên cuda yên li ser vê yekê jî dane berhev, ew gihandine hev û cûreyên van ramanan çi yên rojava bin û çi jî yên rojhilat bin heya bigihê yên islamê yên kevn û nû hemî bi awayekî giştî rûbar kirine û xwestiye wan nêzî hev bike.

---

[1]Bnr. pêşgotina Dîwana Melayê Cizîrî ya transikrîbeya M. E. Narozî û Z. Kaya, weşanên Roja Nû, 1987, Stokholmê.

[2]Bnr. li pêşgotina ser berhema Feqiyê Teyran ya *Şêx Sen'an*, Roja Nû, Stokholm, 1986, transikrîbeya Memo Yetkîn rûpel 31 ; Pêşgotina *Dîwana Melayê Cizîrî*, Roja Nû, 1987, Stockholm, Transikrîbeya E. Narozî & Z. Kaya r. 21-23; Pêşgotina T. I. Dosikî, li ser *Şerha Dîwana Şêxê Cizîrî* ya E. Selam Nacî Cizîrî, Spirez, 2003, Dihok, r. 11-12; A. Turan, *Melayê Cizîrî Dîvanî ve Şerhî*, Nûbihar, Stanbol, 2010, r. 17, 53, 67; M. N. Doru, *Melayê Cizîrî Felsefî ve tasavvufî görüşleri*, Nubihar, Stanbol, 2012, r. 22-23

[3]Binêre pêşgotina *Dîwana Melayê Cizîrî*, Roja Nû, 1987, Stockholm, Transikrîbeya E. Narozî & Z. Kaya r. 21-23; digel guhertinên piçûk ji bilî raveya Yoyler ku jiyana Melê (mîna mesela hirç û rêçê bi zorê) dixe salên 997/1589-1664an, bnr. Li Pêşgotina T. I. Dosikî, li ser *Şerha Dîwana Şêxê Cizîrî* ya E. Selam Nacî Cizîrî, Spirez, 2003, Dihok, r. 11-12; A. Turan, *Melayê Cizîrî Dîvanî ve Şerhî*, Nûbihar, Stanbol, 2010, r. 17, 53;M. N. Doru, *Melayê Cizîrî Felsefî ve Tasavvufî Görüşleri*, Nubihar, Stanbol, 2012, r. 22-23

[4]Johann Wolfgang von Goethe, Dîwana Rojhilat ji Şairê Rojava, wergera swêdî, ji M. Tegena; Naîf Tahir Mikaîl, b. n., r. 66.

[5]Xalid Cemîl Mihemed, el-Cizîrî Şaîr ul-Hubb we l-Cemal, Dar el-Zeman, Demeşq, 2006, r. 94-96 ; A. Tûra, b. n. r. 573-75; M. N. Doru, b. n. r 152-55.

[6]Bnr. M. N. Doru, b. n., r. 88-89